152

Ji Weşanên Êkîtiya Nivîserên Kurd - Duhok

# Pesnên Amedxanê

*Helbest*

**Henîf Yûsuf**

Duhok 2008

***Pesnên Amedxanê**
* Helbest:**Henîf Yûsuf**
* Derhênan: **Mesûd Xelef**
* Çapxane: **HAWAR-DUHOK**
* Tîraj: **500**
* Jimara sipardinê: **414**
* Çapa yekem**:2008 - Duhok**

**Ji Weşanên Êkîtiya Nivîserên Kurd - Duhok**
**www.duhokwriters.net**

www.duhokwriters.net

152

# Henîf Yûsuf

Helbest

# Pesnên Amedxanê

# Diyarî

Ji bo te
Hêvîdarim ku ev helbest têra hin daxwaz te bikin

# AMEDIM EZ

bi evînim, bi birînim
bi derdim ez,
xemkedî me, xudî demim
xudî çemim,
Furate çemê min,
Murate, Arase, Reşe, Sipî ye
bilinde, navdare
Zabe, Dicle ye,
Xabûre,
pir kûre çemê min.

Xudî zeman û çolim,
delav û deşt û giya me
xudî demsal û ba û baran û çiya me
muhra sultan Silêman li sîngê mine
ço yê Mûsa di destê mine
diqelêşim rê ya xwe
diçînim azadî ya we
xudî birûsk û toz û axim
xudî derd û doz û daxim
stûrim weke dêw
nazikim weke xewnên evînê
maldarim, padişaha gula me
padişaha kula me
bilindim, dînim
serê min
li hawîra gulên çelmisîne
li hawîra gulên rû li kenin
xudî mal û mewalim
dem û dewranim
Amedim ez….!

Ez bîr bûm, Usifê pêximber di min
werkirin
yanzdeh heyvim ez
yanzdeh stêr û rojim
ciwanî ya min, giya yê şîne
zarotî ya min, nêrgizên bi evîn bûn
beybûna bi hêvî bû
hêvî ya serî hildayî ber ve ezman bû,
pîrbûna min demên salê ne,
lê çi bikim, ne payîze, ne bihare,
ne havîne qayîle ye,
ne zivistane har û dîne
ne gorne ne zindane,
ez bi xwe salim, demsalim
sedsalim, hezarsalim
ez pîr nabim her ciwanim
ciwanî ya min navê mine
Hilma devê mine
Amedim…!

Xudî dikim zarokan
zarokên ku bi tava heyvê re dileyizin
û bi tava rojê re têne kuştin
bê deng û sedem.
Xudî dikim xurtên bi gera cîhanê re
digerin,
bi derdim,
bi derdekî reş û giranim
biyanim, xumalim, firehim
mezinim, bilindim
pesna xwe didim,
ji jînê re,
ji mirinê rê,
ji kuştî yan re,
ji hiştî yan re,
ji hostekar û pale û cotyaran re,
ji dengbêj û textor û ristevanan re
ez pesna xwe didim
Amedim ez….!

Kevnarim, kevnewarim,
nûgîhayî me,
cefa ye navê min, derdê mezine
min navê we li xwe kirî ye
ji mine ku navê we tevan Amede
ez ber dilê xwe avdikim, bi vê sawîrê
bi va rastî ya li panzdeh
kurk û hewranê we li xwe dikim
sare, seqeme, bapeşka bê fedî ye
ez jinim, kevanî me li ber mala mêran
mêrên ku diherin palê li germa havînê
diherin cejnê li ber devê biharê
mêrên diherin mirinê û namirin
ez bilindim
kevanî ye mêrên bilindim
ez qîzim navê min
Amede….!

Rûdinim li ser textê şevê
weke heyvek zêrîn
şewqa xwe didim ser welatekî dirêj
welatekî gulgulî
guhdarî dengê azadî yê me
xemilandî me
weke bûkek sê rokî, tijî sawîr û
nazikî û hêvî me
Navê min heyve, Peyve
Derde navê min, Merdexwene
Kurde,
rindbûne min bele ye li serê xurtan
hêvî û miraze di dilê evîndarên stûr de
Amedim ez….!

Amedxanim, bê dawî me ez
paşela min tijî newale
tijî nazdarî ya daxwaza ye
her tişt li bîra mine
her kes bi bîra mine
ez bîrim, ez bawerim
hawarim, baranim
baranim ez
heçi yên tî vexwin ava min
heçî yên westiyayî xwe bişon bi min
zemzema we me
hevdema we me
Amedim….!

Ez dûr zemanim,
navê min Amedxane
ji malek xanedanim, ji mala kurda me
ez veşarim, kevneşarim, azadî ya dîn û harim
li çolan û siwêrekan ez xezal bûm
min çêlikên xwe xudî dikirin,
Dimêjandin,
bi bihara şêx Seîd re cîhan li serê min
gerî, çêlikên min serjêkirin,
ez asê bûm- kes nebîne  li ser sînorên
dewletan,
li min digerîn diz
nêçîra min dikirin
Amedim….!

Va me ez
careke din min xwe hilgirtî ye, diçim
berve avezêyan
ez avim, ez axim
ba yê hêlî me,
birûska bi şewq û tavim
serê sibehê ez xunavim
dileyzim bi dilovanî ya gulan re
ze kanî me, avezê me
cobaran û çemên dirêj xudî dikim
Furat hefsare di destê min de
ez dikşînim
ava xwe berdidim ser sînoran
diqelêşim
çiyan ava dikim, hostekarim
ji xûdana xwe sûlavan bi rê dikim
ez beybûnim, bêhna bihar û sibehê ji min tê
xemla bûkan li mine
rengînim, weke aleke bilind
dibînim tê ye hildan li ser bejna min.

Ez dirêjim, bejin dirêjim
kezî dirêjim
gulî yên xwe li badikim serê sibê
bîranînan dicivînim
dixwazim dilê xwe hêdî bikim
dileyzê di qefesa sîngê min de
dikim nakim hêdî nabê
rûnanê dilê minî kevir lêketî
kute kuta xwe ye
min didê ber nalînan, ber ax û
keseran, weke derdekî giran

kevnarim, ez cengim
bi cengan re hatime dinê
canga bê dawî me
şerê hebûn û hebûnê me
ez şerim,
şerekî têrî tijî me
şerekî dirêjim weke azadî yê
şerê heyvê bi ewran re me
şerê xunavê û pinpinîkan
bi sermê re me.

Ez hebûnim, şevim, tarî me ez
weke kezî yên qîzan
hunarî me weke rû yê zerîyên
li ber mirazê xwe
rengê hunê didim
ez hune me li destê bûk û esmeran
şewitî me, bê gunehim
weke zarokên başûr
dema mine ev
dem her a mine
xem her a mine
ez xemim, ez derdim
hêlî me ez bilindim
bêlî me ez
Amedim…..!

Xewna li ber destê sibê me
li ser pişta gê û mêsî me
teşî ya xwe dirisim
kevir kehnîkan ji şivanan re
çêdikim
tevnê li dardinim
cilên mûrî çêdikim li ber sîka
cobelê
çavnêri ya mêvanên xwe dikim
divê ku tidareke xwe bikim
pirin mêvanên min
ezê jê re rêxim cilên xetsor
li ber lingên wan
rojava radibim, ji bo şîvekê çêkim
ji mêvanên xwe re
tevna min li dare
her rojê dineqşînim aleke dirêj
weke bejna azadî yê
mêvanino, rêwîno, bilindino
tevna min li dare
dineqşînim ala xwe
Amedim ez….!

Ji mala mêra me, ji mala Şêxim
ji mala Temirim
ji mala nemirim
qîza mala mezinim, mala kurda me
zelalim ava Feratê kûrim
dengê bayê hêlî me
delalim, Hêveronim
Gulîzarim, Dîlberim
Sînema ser bi dûmanim
Xaca ser bi zêrim
Keja xizêm şorim
Bêrîvanim, kenêra min bi şewqe
Xezalim ez, xifşên min dileyzin
li dora min
karê xwe dikim
weke felekê ji ya xwe namînim
ez bangim, miletên derveder
min bilind dikin
hildidin tijî dengê xwe

Ez xewnim
yar û neyaran ji xew radikim
li nîvê şevê
rastî me ez, xwe dikim
pêjneke dilovan, dikevim
hembêza candarên ku çiya
tijî kirine bi jiyanek fireh
weke dilê nemiran.

Dîlbera Faqî yê Teyranim
cejnim, şahbûnekim, seyranim
ez çira me pêketî me
çira mala Tamirim, mala Badirxan û Şêxim
çira mala we me
zêrînim, bazinê destên qîzame
zîv û cewahîrim, destikê xencera
Cebelî yê mîrê Hekarî ya me
ez Edûla paşa yê Milî me
gulî biryayî me
werin Delalino, ez gulî yên xwe
ji hespên we re bi hefsar kim
ez dîlokim di devê sazbendan de
dîrokim di devê cîhanê de
serpêhatî yen mezin ava dikim
min binasin
va me ez pesna xwe didim
de bibhîzin
Xwetûnim, Amedxanim
Paytextim….!

**Heleb, 1991**

# LEWJA SÎNORAN

Bilinde birîna min, ala min ya
dengdare weke heyvek li panzdeh
li sîngê mine
heyvek purteqalî ye di sîngê min de
nişana mirin û jîna mine
diherim berve stêran li hemû
Ezmanan
birîna min ya har û dîn
vedikê devê xwe weke
Gurekî birçî li meha sebatê
dikê qorîn birîna min
her vekirî dimîne weke
derî yên ezman

Bilinde birîna min, li enî ya
min ya bi zêre
di bin kofî ya rengîn re
şewqa xwe dide xêm û çolên bê
pîvan
şemala xwe davêje
ser zevî û veşarên zemên, weke
konekî li ser hezar stûn û dîrakên
tîrêja fireh.

bi şewq û şemal û birîna xwe
înanim
lewjim ez xanî yê saz û helbesta me
mehşarim bajarê mêra me
rojên jînê me, name ya dem û
salê me
şemî me, yekşemim, duşemim
sêşemim, çarşemim
pêncşemim, înim, dînim
kînim
kîna azadî yê li dilê dinê me
bihara rengînim
havîna bi qayîle û tînim
payîza bê çare me
zivistana gergînim
adiyamana bi govend û seyranim
Botana Mem û Zînê û Mela yê
dilheyranim
Batmana bi kanî û petrolim
ji cîhanê dilgiranim

Bi hêrse xeyda min
bi kele qehra min, bi şîne
bi şewate
disotînê hestî yên laşê min
dihelînê berfa şahbûnê di sîngê
min de
ava germ û kelî
di ser min re dibohirê
cobarên xwe yên rêzdar sazdikê
axîn ji min nayê
tenê qehra min girane
Şwwatî ya min kûre
barê li dilê min
çogên min xarkirine, weke
kevanên sîwaran, li talan û
şerên meydanan.

Barê li dilê min
ne şelekê êzingên tere
ne barê komira kevirî ye
ne barê xo ya pesara ye
ne barê nokên qerac û deştane
ne barê kerwanên rê dûrin
ne barê mirina reşe
na jî barê jîna geşe
tenê girane, kûre, bi şewate
barê dêwê navsale
barê şêrê kale
barê çavşikestîna bêbexte
barê sîwarê Hespê ling şikestî
û bê rexte.

Dîsa ez tême bilind, weke
birîna xwe
hildayî me tim û tim
li barim weke tivinga leşkerên
azadî yê
ji dûr ve têm
ji nêzîk ve, ji taristanên
bê dawî ve
ji daristanên agir pêketî
ji nava xelkê ku topa xudê lêketî
ji nava mirazên te û nazikbûna
bejna te
ji nava dilxwazên te û temaşekarên
cejna te têm

Ji kezî yên te yên koçerî
ji porê te yî qeterî
ji derd û kulên bi şax û bi serî
ji tarî û kuştinên bê deng û bê binî
ji bêhna sibehên serjêkirî û sêwî têm
ji gundên wêrankirî
ji rezên berankirî
ji sîka zinarê reş têm
ji torbûna golikê enî beş têm
ji dadmendî ya beranê Xecê û
Sîyamend ve
ji asêbûna pezê kîvî û kedîbûna
hurç û hovên çolên me têm

Sînorên min ji kulavên
Erziromê de destpêdikin
ji berfa Sîrtê de
ji ba yê Qarsê de
ji ava Wanê û deşta Mûşê de
ji rezên Entabê ta bi pêsîrên
Orfa ya şewitî û kela Mêrdînê
sînorên minin.

Meraş û Erzencan, Sîwas
Melatiye, Bitlîs, Dêrsim
Agrî, Xerbût
Hekarî ya mîran û Pertew begê
ristevan
Mehabada bi ((çar çira))
Hewremana şerên dirêj
Kenar û kevî yên Ormyia gola Şîn
Kermenşana neqişkêş û wênekar
Senendaca bi gir û dûman
Zaxo, birîna kûr
Berzan, dîroka bê binî
Hewlêra kela nemiran
Şehrezora mêran
Dihoka bêxêrê dirêj
Kerkûka ser bi zêr
tev sînorên minin.

**Heleb, 1991**

# HELBESTA ÇEKDAR

Ji helbestan tu çekdare
di govenda Pêşmergan de
li badike desmala azadî ya
miletekî bilind
li ber awê kurmancî
li ber def û zurnê istirana xwe dibêje
dengê xwe dikşîne weke şûrê
pêximberan
û qîrdike

Ger navê miletekî kurd be
yan navê welatekî kurdistan be
divê ku helbest jî çekdarbin
ji lew re va me di govenda
xwe de, ez çekdarim
nêçîra mêrkuj û welatkujan dikim
dil daxwazên min
di destê min da ne
saz awazên min
di hestê min da ne
çek û rextên min
di bejna min da ne
soz û bextên min
di cejna min de ne
nav û dengê min
di soza we da ne
jîn û pesnên min
di doza we da ne

# KOTIKA
# QUL

Li ser bextê xwe yî reş
li ser textê xwe
textê zêrîn
textê darî
textê amadekirinê ji bo çûna
bê veger
de bigrî, weke keçek bihortî li ber
derî yê pîrbûne xwe, û hêstir li
çavan ziwabûne li benda mirazê
bê çare û asê.

De bigrî, yan jî binale
binale weke nexweşekî li ber candanê
ku ji heft rihan yek tê nema ye
weke birîndarekî birînek reş
ku bi derdê xwe de ketî ye, hêvî
birî ye ji zivirandina li xudiyan.

De bigrî weke çiyakî top lê ketî
weke erdek qelişî, yan jî
weke miletekî derd pêketî
de bigrî tijî hêrsa xwe
were xwar weke xudakî ku tê xezebê
de bigrî heta ku ji te tê
guliyan li bake
desmalê ne xe berîka xwe
hêstirên xwe bernede erdê
da ku kes di gola rondikên te de
ji xwe re li masiyan negere.

Ezê dîsa bêm bigrî
Lê, di keri de
di keri de bigrî, bira kes li te
şahnebe û şar û şîretan li te neke
ez di bextê te da me
di nava govenda koleyan re
mer û metê
da ku tol û teresên demê, bi dîtina
bejna te ya nazik perik nedin û
hêvî yên min careke din nedizin
ew jî gunehkarîke mezine, gava
mirdarên birêz li te bicivin
hilpekin di dora te re û bi wê jî
xapandina mirazê min bikin

De binale weke dêwekî navsal
weke çeqelekî birçî
weke marekî dûv qut û bê guneh
weke kurdekî bê çare û bê miraz
weke kurdekî bê qedr û qîmet û belengaz
weke kurdekî bêzar û dil bi kul û xêrxwaz
de bigirî li ser textê zêrînî
bi çar niçikan
de bigirî ji ber kîna xwe
ji ber jîna xwe
de bigrî azadi ya min bigirî
bi kurtî bigrî,
bi kurdî bigrî,
bi heyvê re,
bi daran re,
bi kevir û kuçikên çol û banyan re
bi Edûla paşa yê Milan re
bi Xezala ku rû sor bûne,
ji ramûs û şerm û xeydan re
bi Eyşana ku bi fîstanê sorî
melesî diherê û tê di nava
gundan re.

De here bi rê û durban de
ço yê xwe bi dest xwe ke û
ewke pezê xwe
istirana xwe tewke
bipeçine xewna xwe û di xew ke
hîna dirêje şeva me
de here di demê de weke zêrekî
veşirtî di bin erdek kes şofê
nabê ser de
ji navan tu Qedere
qedera bi çirtik û bê kembere
qedera Mîrê Misirê, xudayê
sebra reş û zêrê zere
kotika qul bi pî yê te ve weke
Camêrekî gunehkarî bi darxistî
kotika qul bi pî yê te ve ye
digerê li nav malan
li ber devê deriyan
parsa evîna reben dike
pirsa evîndarên kuştî û mirdarên
hiştî dike.

Ger tu av ba, minê bi gota
ji avan tu hêlî ye
weke çiyakî ser jêkirî asêbûna
xwe dike
Ger tu xem ba, minê bi gota
ji xeman tu bêlî ye
weke miletekî koçerkirî karê xwe û
derdên xwe dike
nazdariyan jî dihêle ji heyva ku
xwe di piş ewran de vedişêre, ji
tirsa qêrînan
heyva ku paçan dixe guhên xwe
da ku nebihîze û ji textê xwe
netê xwar

lê, ne xeme gava ku tu dûr herê
ezê bankim de were
de were weke zîvê heyvek li rû yê
ezman
kofî û xencera xwe amadeke
de were bi bejn û bolava xwe ya
kurmancî yê
bistire hevîrê xwe
sêla xwe li kuç ke
di talda zinaran de
di sîka dîwaran de
li ser agirê demê
bese, êdî zikê xelkê dirî ji nanê
cehî û bizilme yên garisî

De were lêy, were
em agirê xwe dadin
di ber re jî tewkin û
istirana xwe dadin
bi ser de jî
gazinan di xewkin
azadî ya xwe û welatê xwe dadin.

# PIRSA DENGBÊJ
# Û
# TIRSA DENG

# DESTPÊK

Ji nû de destpêdikim
ji serpêhatî yên reş de
ji êşên bê dawî de
ji birînên bê binî de destpêdikim
bi evîna xwe
bi jîna xwe ya dirêj weke bejna
dengbêjekî
bi istirana ku weşî ye ser rê ya
tîpên pirsek sipî navê xwe
((Dê were virde azadî şêrîn))
dîsa pirsek sipî ye
çima azadî dengbêjan dikuje?

# LI BANÊ YE
# LI XWARÊ YE

Nizanim narê ye, nizanim kevoka
li ser şaxên jîna min û darê ye

nizanim li banî ye rojên mine
nizanim di korta dilê min de
li xwarê ye

nizanim xunava serê sibê ye
nizanim barana meha nîsanê
bi ser serê dinê de dibarê ye ?

# TÊME BERVE TE

Ji bejna te nazik re
daxwazên xwe dirisim bi teşî ya
rojên dijwar
te yê xwe dikim gilok pê xurca
dilê xwe bi hevdixim
alîkî wê tijî xewn û xeyal dikim
alî yê din jî tijî melûlî ya kûr û
stûxarbûna xwe dikim
û bi lez, weke hespekî tor
weke xeberek reş
tême berv te.

# XANIYAN AVA DIKIM

Di meydanên dilê xwe de
xaniyan ji te re ava dikim
da sibehekê te bibînim ku ne tenê
tu xewne lê belê gulan jî avdidê

Di bêzarî ya çavên xwe de
hawîrên dûr û newalên kûr diçînim
da ku tu kude herê te bibînim
ji ber ku her dinêrim hawara xudê bê
di jarbûna laşê xwe de te dibînim
di tamarên xwîna xwe de
Di serî yê xwe yî şikestî de

Va siwar dibim li şeva xwe
diçim bi rê û deveran de
nazikî ya dêmê te diherê û tê
li ber çavên min
dibuhirê di nav xem û xeyalan re
tenê diherê û tê
nizanim çima tu cî nagrê?

Di nava mij û morana êşa reş de
xwe dibînim tême kişandin
berve şemala rû yê te
berve nêrînên te yên ku dîroka
nazdarî yê tînin ziman
berve nêrînên te yên bi tirs
berve nêrînên te yên bi pirs
ku ji min dikin pirsa min
pirsa şêt û dijwar
pirsa derdê min

Weke xewnek şêrîn tu xwe vedişêre
ji ber awirên min
xwe dide alî û winda dibe
lê belê te dibînim
ger tu hilfire ezman
ger tu li heyvê bê
yan li jorê bê
weke xudakî veşartî
yan li xwarê bê
weke pîrekek li ber malê
te dibînim,
ger tu li ser darê bê
li bin darê bê
li ber dîwarê malê bê
li ber avê bê, li ber tavê bê,
te dibînim,
te dibînim gul,
te dibînim kul
te dibînim xem,
zeman û wext û dem,
her tu wî
di rojên min de!.

# BÎRANÎN

Ji pêsîr û taximê sîngê te de,
agirê keseran alafa xwe ya har,
dirêjî xwîna min dike
dilop bi dilop dadiwerivim,
dibim leke li ser şapika istiranên
serê sibê.

Ji pêsîr û taximê sîngê te de,
cîhanê dest bi şerên xwe kir,
kuştî bi mirina xwe mijûl bûn
birîndaran jî xewnên xwe amade dikirin
min jî ber dilê xwe avdikir
ji ber ku,
min xewna xwe bi roj dîtibû

Ji derdorên pêsîr û sîngê te de
serîhildanên mezin rabûn
dîroka talanan dest bi karê xwe kir
pêlên deriyan hêlî dibûn û li dûr
hêlî dibûn û dadigerîn
dimeyîn li ber hilhatin û dahatina
sîngê te.

Ji gerden û pêsîrên te de
miletekî derd pêketî
li çol û bêlanan dînbûna xwe dikir
tijî dengê xwe dimir
tijî mirina xwe dibezî ser feleka
Xayîn.

## KÎ DIZANÊ EW KÎ YE?

Ser bi zêre, pey bi xêre
ne bikare, ne bimêre
kî dizanê ew kî ye?

Dêm zerî ye, ne istêre
him gerdene, him jî kêre
kî dizanê ew kî ye?

Newq zirave, wek sûlave
geh barane, geh xunave
kî dizanê ew kî ye?

Gulperî ye, çav beleke
him cîhane, him feleke
kî dizanê ew kî ye?

Him zimane, him jî peyve
geh birûske geh jî heyve
kî dizanê ew kî ye?

Bilind bejne, wek dîware
geh peya ye, geh sîware
kî dizanê ew kî ye?

Çar demsale, ne sersale
bi şapik û ser bi şale
kî dizanê ew kî ye?

Çavziwa ye, ne kanî ye
bi derî ye, ne xanî ye
kî dizanê ew kî ye?

Him leşkere, him sînore
poz bilinde, poz li jore
kî dizanê ew kî ye?

Dergevane, derî şeve
geh belave, geh li heve
kî dizanê ew kî ye?

Him sotî ye, him Botî ye
kê pirsî ye, kê gotî ye
kî dizanê ew kî ye?

Gerden gaze, ne canbaze
ne çerkese, ne jî laze
kî dizanê ew kî ye?

Dêm gulî ye, dil kulî ye
evîndara vî dilî ye
kî dizanê ew kî ye?

# JI BO DÎLANEK NERM

De were ezbenî
çima tu bêzarî weke dêwekî navsal?
şevê dibuhurin
rojê derbasdibin
xelkî digerê li dor xwe, weke cîhanê
tenê bêzarî ya te maye di cihê xwe de
weke bûka li ser hespê!
"bûka li ser hespê,
kes nizanê qismetê kê"
weha ji min re hate gotin, lê tevî wê
va bûka te di dilê te de ye, peya bû
ji hespê xwe
û hîna jî bêzarî ya te palvedayî
li ser rû yê te, weke miroveki li malê

Ka de were ezbenî
para xwe ji bêzarî yê
bide hespê şevê, li şûna cihêrek ceh
Û dakeve nava tavê,
govendek fireh avake
dîlanek nerm şênbike.

Ka de were ezbenî
ma qey ne bese sertbûna awirên dinê
ji me re
û bilindbûna girê xeman, weke
ejdirhakî li ber bejna me?

# EV ÇÎ YE?

Demek dirêje
demek mezine
bilinde weke çiyakî giran
bi min dileyzê û bi ser de jî
ez ji xwe re kirime evdal

## SIWARBE SIWARO

Çûme berve rênirînê
min go çima tu dirêj û bê dawî ye?
go ji ber ku rênirînim, nizanim
dil yeke nizanim dil dudune?

Çûme berve dilê xwe
digevizî weke hespkî birîndar
di xwîna sor û derdên reş de
jê pirsîm ji tirsa xwe re:
tu mirî ye an mayî ye?
berkenbû û got:
siwarbe siwaro li xanê zîne
zengiyan bişidîne
rê dûre siwaro, westan nêzîke
erd hişke, ezmanî dûre
de were siwaro dildila te me!

# CAREKE DIN

Va me ez
ji maran tazîtirim
ji guran birçîtirim
ji miletekî bilind û navdarim
ji miletekî gazindok û sêrkarim
ji miletekî bi lewjim
" naşikê û danayê
bi topên zeman "
ji derdan re dibême derd
ji merdan re dibême merd
ji azadî yê re dibême erê
ji mirinê re erê û na
dibême NA!

# NIZANIM EZ

Çima ewqas tu  nazike
çima ewqas tu ciwane
çi bêjim ji te re
çine peyvên
ku di kûrbûna te hilên
helbestên
ji dûrbûna te re bibin rê
ewrên
ji bejna te re
bibin baran û keskesor?

Çine xewnên
ku ji rûniştina te re, li hewşa
dilê min
bibin darên bilind weke bejna te
kulîkên dilovan weke bêhna te
çi gotin wê têra nazikî ya te bikin?

Çi bêjim dema ku
miwîjên hûr û zelal dibarin
tene bi tene ji devê te yî gûlînî
şerbeta hingivê çolan, dadiwerivê
dilop bi dilop ji ser lêvên te

Çima tu ewqas nazike
çima ewqas tu ciwane
ji bo çi?
ma tenê ji bo min bi êşînê?
min bibûre, zanim ku êşa min
ne daxwaza te ye
ji bo min bikê kuştî
û bidê ber rû yê cîhanê?
na,
zanim tu naxwazê kuştina min
ji bo li min vekê dergehên jîna
gulperîn?
nizanim, ez nizanim
çima ewqas tu şêrîne
porşevînê
çima ewqas ji te tê hilma
gulên sibê
ji te tê bêhna
sibehên tijî hilma te?

# MIROVÊN NÊREMÊ

Serêşa ker bû di dilê min de
guve guva ba yê kur bû
ez dixistim ber toza payîzê
axîna mêrkuj bû
tîra xwe di xwîna min de badida
weke dirêşa koşkarekî hostekar
her weha jî dişewitîm

Dem diçû bi rê ya xwe de
şewatî jî diçû bi canê min de
her ku kûr dibû, axîn bi dûr diketin
axînên reş û sipî dibuhirîn
silava xudê jî li min ne dikirin!!

Ji lew di nav wê yekê de
lerizîm
tayê bi min girt weke êzingekî hişk
av di canê min de ziwa bû
bezîm ber pixarê
agirê tîna xwe min dada

Dûman bilind dibû
xûya dibû ji dûr û nêzîk ve
xelk dibezyan, kunên avê hilgirtibûn
gava gîhane ser pixarê
devê kunên xwe bi hev re vekirin
û dûmanê reben, stûxar vegerî
bi ser min de

Firokin rengîn bombên xwe berdidan
li nava gund
dengê teqînan berv ezman bû
sîwarên xeybê zarok didizîn
û bi ser wê gî de dîsa jî
ava kunan dihate xwar
bi ser pixara min de weke
şurukên zivistanek gergîn

Şewatî diçû ta dihat
welat diçû diz dihatin
zeman jî diçû û dihat
nizanim xwin bû, nizanim restî bû
nizanim kenê şeytên bû
min dît ku li ezmanê toza payîzê
welat bû keskesor
diz di bin re derbasbûn, bûn
mirovenî nêremê!!

# NARÎN

Narîne jê re dibêjim narê
sîka xwe davêje ser westana min
jê re dibêjim darê
bi newala sîngê xwe
û bi herdu destên rojînî
dileyzkînê dilê min
jê re dibêjim yarê

# SETEM

Ax
çi seteme ku mirov
qulqulî bin
weke serada bêderek şewitî
cûcebin weke hespekî darî?

çi seteme ku mirov
biçelmisin
bibuhirin
weke kulîkên jehrkirî?

Çi seteme ku welat teng bibin
weke bêhna mirovan?

Çi seteme ku ez vemirim
weke agirekî kevnar
di govenda azadî yê de?

Çi seteme ku derd bibin derman
ji qehra me re?

## PIRS

Ga mirin
çêrm jî şewitî bû dûman
bi ezmanan de firî û şopa xwe
windabû
mirov mirin
nav jî ji bîr bûn, yan jî
hatin ji bîrkirin, di binê bîra
ziwa û gunehkar de
hîna jî em dibêjin:
“ ga dimre çerm dimîne
mirov dimre nav dimîne “!

# ÇI BÊJIM?

Çi bêjim çi ne bêjim
nizanim rojek ji rojên demê me
bi êvar û şevim
nizanim ta yê nokê me
bi sûravk û xûdanim
kulîlka agirê şînim
evîna bi lêv û devim?

Nizanim mirazê
xêrnedî û stûxara me
belavim, delavim, peravim
radibim, radibim

Ji mine ku ez li hevim
kab û kulî yên min sist dibin
ji hev dişelim weke
dîwarekî herî yê yî kevnar
nizanim çima
nizanim xêr dikevim?

## ZENGIL

Êdî bese te tînginî
bi guhê minî çepê xist
tirs û sawîrên reş
te xistin nava min
êdî bese te xelk li min şahkir
êdî tirsa mine, tu her weha bimîne
welatê kole yên rêzdar

Êdî bese te kerwanên rê dûr
ji min û xwe derbaskirin
barên çît û hunê
dînan ser rê ya agirê hov
û her tim fermana xwe bi min istand
yekser te dîna pêş min

Bêzarî ya nexwaşan
melûlî ya darên payîzê
dawerivtina berfa bihar
qelişandina sîngê gelî
û newalan
û te xelk li min şahkir

Va dikşînim derdê xwe
dihejim ji ber ba yê reş
diherikim weke cobarekî sêwî
dîsa jî tînginî ya te
di guhê min de bilind tê weke
zengilê dêrekî kevnar
weke marşa cengên berê
bi rêzdarî û bê pirs, amade dibe
weke tirsek mezin!

# ZANIM EWE

Keskesora bana me ye
jana me ye cana me ye

Şêrîn xemle nazik xêze
geh li yane  geh li rêze

geh dîloke geh dîroke
him helbeste him çîroke

Giran heyfe bilind heyve
padişaha şêrîn peyve

Bi fermane bi leşkere
bi kofî ye  bi kembere

Xudî peze xudî reze
bê arame  pir bi leze.

# BÊJE JI MIN RE

Ew xema tenik û dirêj
çima nehat
tevî ku rûniştibûm li ser sîngê şevê
û rênirîna wê min dikir?

Ew heyva zerî weke kevanekî zêrîn
xêre hilnehat
Da ku zanibim sibe cejne?

Ew dêwê sê serî
çima xwe îşev veşart
ji ber xeyda min?

De  bêje ji min re, ka çima
xem nehat
heyv hilnehat
û dêw xwe veşart
bêje ez qurbana te me
ka çima?

# NE XEME

Dibe ku niha
çavnêrîna min dike
li dûrî hilma devê birîndar
li dûrî şerê welat
li dûrî xerabûna dinê
li nîvê şevê
li ber derî yê westanê
dilovane, dengê şevê dipê
ne xeme
ji ber ku yara mine!

# GAVA TE QÊRÎN HILNEDA

Divê ku ez lomekarî ya te bikim
ji ber ku rojek ji rojên wê demê
min bi çavê xwe dîtibû
cinewirên çolan û teyrên ezmanan
li ser taximê sîngê te diçêrîn
li newalan jî
ciwêlek û padişahên zemanê reş
rûniştibûn li ber dîwarê malekê
mirovin rû sar jî
destê yekî girtibûn
bi xwe re dibirin!

Li ser pêsîr û sîngê te
bi hêrs û gunehkarî dimeşîn
di ber civata ciwêlek û padişahan re
de bêje ji min re padişaha min
çima te nekir qêrîn
û kesek ne tirsand ji wan mirovanan
tenê çavmelûl ez berdam
di nav lepê mêrkujan de ?

Divê ez lomekarî ya te bikim
lê ji ber ku
lomekarî ya kesên padişah nabe
ji lew gazî dikim
peyvên xwe dişewitînim ji te re û
xalî ya agirê xwe
bi ser birîna xwe werdikim
dixwazim devê birîna xwe bigrim
weke çawa xelk dixwaze devê min
bigre
ez di bextê te da me, de bizan
ku qêrîna te çi bi serê min kir
gava te ew hilneda!!

# DEZGIRTÎ

Dezgirtî ya vî dilî ye
serbestî ya gulan didê min
min ava dikê bi tîna xwe
weke cîhanek bê derew

Dezgirtî ya dilê mine
bi hêvî yên bilind min xudî dikê
min berçav dikê
weke evînek kûr.

Weke baranê, weke çolek dirêj
derbasî têhbûna min dibê
çemên fireh dibuhurînê
di ser sîngê min re

Derdên reş didê ser xewna nîvê şevan
û birînên sipî vedikê
birînên sipî weke hestî yê miriyan.

# ÇEMO !

Va me li virim
min ji bîr meke bi xwe re bibe
tev xem û xeyalan
tev xumxum û dengê xwe
avjenîkarekî sistim
avjeni yê baş nizanim

Her ditirsim ku gava
di nava te de bikevim, tu yê
bê hesret min çeke alî û bihêle
ji cinewirên çolan re
ji bêhna gemirî re!

# DEMA REŞ

Ez dema reşim
tijî tirs û gûman û
reşantî ya gunehkarim

Ez dema reşim
tiliyên cefakêşan û xwîna dilan
reş dikim
û ji hêlekê de jî
dilên xwîn sor, derbasî azadî ya
bê çare dikim di ser pira
birînên kûr re …..

# BILIND DIBÛ

Rûniştibû li ser dîwarê şevê
ne bi hêrs bû ne bi xeyd bû
ne bi şal bû ne bi şapik bû
lê bi çavên xwe yên xezalî
şerê padişahên rojê dikir

Ne navdar bû ne maldar bû
hema
xudî ya çavên xezalî bû
serî dihejand, li badikir
weke çawa derdekî kûr, dengê xwe
bilind ke
bilind dibû

Xelk şevkûrî bûn, ne didîtin
bext reş ma
di dîwarê şevê wer bû
gava bezîme ser, çavên xezalî
vemrandî bûn
tenê digotin:
“ Ax ji derdê vî zemanî “

# LI SER BEJNA KOÇERÎ

## *pişti azadî ya Pol Êlwar

Nizanim ji eşq û meraq û sewdan
nizanim ji kul û jan û derdan
şiyar dibim ji mirina xwe
ji jîna xwe serî hildidim
bi hatina herdu cavên kurmancî
bi bejn û bolava koçerî
bi dêmê topî zerî
bi biskên porê qeterî
porê asê û kedî mîna Xezalên gelî yê Elî

Careke dî radibim ser xwe weke
şervanekî kevnar û berve te têm
ji mêrûstanê derdên xwe têm
ji nav konên konreşan
ji mala bavê te têm
ji xûdana enî ya havînê
ji kela dilê biharê
ji bêzarî ya demsalên sala te têm

Ji kembera qehra di nava te de
ji kila sibhanê ya çavên te
ji nînika zêrên li enî ya te
ji kutrepa xeyda hundir zikê te û
ji xupxupa ava çemê meşa te têm

Ji tersbûna çerxa felekê û
Nazikî ya navê te
ji hola Çarçira ya te û qadî têm
ji ber serê gorna Welî yê dîwane têm
ji axîn û lewjên binê zindanan
ji newala Qesaban
ji daristan û rewşen û taristanên te têm.

Bi Lorî û Gorî û Sorî têm
bi pozê çiya yê jorî têm
di mij û moranan re
di dengê goranan re
bi kurdî û çolbir ez tem, ku
bineqşînim navê te, bidim ber darê
Bedeneynê, ji meraqa dilê xwe re
bixemlînim,
bi benî yê morîkan
bi kespikên evîna xwe
bi ava Boyerûnê.

Li ser xizêmên bedewcan û ciwanikên me
li ser destên bi hune
li ser kemberên zîvî
li ser qame û xencerên peya yên şevreşan
li ser kofî yên pîrejinan
dineqişînim navê te.

Li ser nîkê teşiyan
li ser kirkîte tevnan
li ser şîş û mendelên deriyan
li ser lîwana devê hespan
li ser zîle û zengilên stûyên
beran û berxan
dineqşînim navê te.

Li ser lat û zinar û benên te
li ser girî û hesret û kenê te
li ser kirasên Melesî
li ser pepilên teyran û nikilên kewên te
li ser devê cinewir û dêlgurên newalan
li bin zikê marên gund û çolên te
li ser kulîlkên hinaran
li ser dûvê marmarûşkên havînê û
axa welatê jehirkirî
dineqşînim navê te.

Li ser devîkên kozên pezê te,
li ser pelên çilo yê rezên te
li ser basikên pinpinîkên biharê
li ser dûvê roviyên çiyayên te
li ser qizwanên te,
li ser ezmanên te
li ser def û dehola dewatan
li ser zurne ya kirîfên te,
dineqşînim navê te.

Li ser gihanên helek û miyan
li ser qoçên bizinan
li ser kela dilê ewîl û maxûlan
li ser dîwarên kela Dumdumê
li ser zinara Mêrdînê
li ser tavika heyvê û manga rûyê te
li ser çît û cawê reşmalan
li ser meşikên qetyayî
li ser şîrê rijyayî
li ser hesret û kesera dilê Edûla
gulî biryayî
dineqşînim navê te.

li ser darê dergûşan
li ser kevirê delûbên li nava gundan
li ser kotik û tûrikên qereçî yên binê konan
li ser dîlokên devê şêxik û şêxemokan
li ser xunava lêvên rindan
dineqşînim navê te.

li ser pirça ga û geyîkan
li ser devê gumgumokên berqef û rîşên te
li ser mera ciwêlekan
li ser darê zembîlên Zembîlfiroşan
li ser perên şalûl û maman
li ser simên pezê kîvî
li ser kevanê keskesorê
dineqşînim navê te.

Li ser dua û qulwelên sersal û amînan
li ser girêdana devê cinewir û guran
bi kêra berîkan
li ser serê çaterê û kendalan
li ser kevirên pêpalgêh
li ser sewkî yên gund û şoreşan
li ser axa tiberka goristanên şehîdên te
li ser telasimê xaşxaş û şikeftên kevnar
dineqşînim navê te.

Li ser rengên pîrkên milikdas
li ser filûsbûna zêriyên binê bîran
li ser pûstikên kundirên payîzê
li ser dûvik û kumikên kivarkên serê sirtan
li ser bêhna toprihanan
dineqşînim navê te.

Li ser devê hevringa şivanan
li ser sorsorînka pişta pezê te
li ser bejna bêrîvanan
li ser ser sîngê delav û çîmenan
li ser niçikên pêwir mizînê û hemayloka
Meryem Xana tenûr dadayî
Dineqşînim navê te.

Li ser pişta masiyên golan û
li ser pişta ga yên sor u reş
li ser pelên kulîlkên agirê te
li ser şînê çivîtê û sipîbûna kirêca
hundirê te
li ser darê sipirgehên zilî
li ser tej û berên kulînan
li ser destikê misînê avdaza te
li ser qubeya xanî yê laleşa bê guneh
dineqşînim navê te.

Li ser guşguşa tavên biharê
li ser guvguva ba yê kur
li ser toza babelîskan
li ser qurqura karkûrkên ava deştan
li ser kevirê kûran û qedera me
li ser çûvçûva kurmê temûzê
li ser gurgura hêstir û rondikên bêzarên me
dineqşînim navê te.

Li ser pêsîrên Sîpanê Xelatê
li ser kevî û kenarên ava mezin
li ser latên gemî ya hezretî Nûh
li derdorên Pîran û Mîran û Wêran şaran
li nav erdên qulên mişkan
li ser lingê hespê Derwêşê Evdî-Delal û
mêvanê mala bavê Edûla paşa yê milan-
li ser ruma Hemê Mûsikê bavê Nûrê
li ser enî ya xifş û çêlikên guran
li ser pêlavên pêşmergên Bamerna şêran
li ser darê tembûra Mihemed Arifê Cizîrî û
fîstanê Eyşana kurdan
Dineqşînim navê te.

Li ser textê westana xwe
li ser nivîna şevê
li ser sîvlekên xanî yê mala bavê Keserxanê
li rûpelên kitêba reş û felsefa kurmê darê
li ser kevir û kêlên tirba Mem û Zînê
li ser dengê hêrsa heft aş avê li ber ava
Nisêbînê
li ser xatirê Mûsa Enter û reş birînê
li ser guhên mamoste û feylesofên binê dunya
nezanînê û
li ser guhên kerê qiyametê li ber sîrat û mizînê
dineqşînim navê te.

Li ser dengê pepûkan
li ser gilçê xûçik û bira yên kerengan
li ser zangoyên koleyên xudayê erdê û
li ser zangoyên refê sînik û tîntoran
li ser dûvê dûvmeqeskan
li ser destarê gêran û bêdera genimê mîrê
Xerzan
dineqşînim navê te.

Li ber ziyareta dildar û şehîdên te
singê mirazê xwe dikutim, bi çakûç û
tomaqê omîda, kose yên ku hîna li benda riya ne
ji xwe re dipeyîvim û dibêm:
nizanim zerî ye
nizanim perî ye
nizanim mizgîna xudayê xêrê ye
nizanim telama nava vî serî ye
dipeyîvim weke dengbêjê te:
"dê were virde azadî şêrîn
çav westiyan hingî li te dinêrîn".

# SÎ Û ÇAR SILAV

Di nava kolanên bajarên mezin re
di pozê çiya yên bilind re
di daristanên tirsa reş re
di nava rêgirên demê re
di taristanên rêzdar re
sî û çar hespên mirinê, li min
derbasbûn ta ku bi qada xermanê te ketim.

Sî û çar salên minin
navê min kurde, weke navê miletekî
qedexekirî ji azadî yê.

Sî û çar salên minin
digerim li dora dinê, weke nêçîrvanekî
ku sewda çiya û çeman di serî de û
dev ji rika xwe bernade.

Niha jî li dibistana sîngê te me,
dixwazim fêrbim, bo çî
çiyayên bilind roka me li sere
bo çî hingivê çolan dadiwerivê ser rê ya
pêşmergeyên me
bo çî xuda yê stûr
bêhna beybûn û binefşên salê
xiste bejna te?

Ji nava hemû xewnan, tenê tu
sibê tê, li beyanê
bi dengê cotyar û ciwêlekên gundan re
bi meşa xifş û xezalan ber ava çeman re
tu sibê tê
çi keske va bejna te
kirasê dar û delav û çîmenan li bere
çi zere kembera nava te
careke dî li beyanê
çiqas sore kirasê te, min mat dike
nizanim te gangiliyên biharê
bi ser xwe de berdane
nizanim rengê birîn û sewda min li te ye?

Di derdê bê çare de
di wêranên reş de
min qehra xwe digihande hev û dicivand
va amadeye mayîna min
digerim li çiya û çeman
li daristanên dûr û şaristanên biyan
li paytextên dinê
li kolanên rezan, li derdora malan
digerim li avahî ya mêrkujan
divê ku ji binî de bînim xwar.

Sî û çar salên minin
digerim li avahî ya mêrkujan
da ku mayîna qehra xwe lêdim û
ji binî de bînim xwar.

De bêje ji min re
ez di bextê te de me, bo çî
xuda yê dar û beran
sînorê mestbûna xwe xiste nava
pêjna te
bo çî xuda yê çem û deriyan
ava jîna min xiste nave tiliyên te?
Bo çî xuda yê bêzarî ya min
gulên meya pêximberan, çandin
li ber wa ava tenik li ser lêvên te?
Bo çî ew geza nazdar
ta rojên îro nebûye lewja niştimani ya
Welatan?

Li dibistana sîngê te
dibînim ku beramberî welatan, tu
dildaran jî ava dike
de bêje ji min re
bo çî ewqas tu kurdî û yekser
bi tora pêjna te ketim
nikarim û naxwazim rizgarbim jê.

Di rê ya demê re
di welatê dengê çemê re
di welatê rengê xemê re
dibînim ku
kurdî ye jorê min, hemû stûnên bana min
ta bi taxa ezmanê heftan
kurdî ye jêrê min, başûr û bakurê
xewnên min
rojhilata dilê min
kurdî ye tirsa min
Belê kurdî ye tu
kurdî ye porê te
kurdî ye meşa te li paytextên dinê
li kolanên Etrûşê
kurdî ye manga li ber pozê te.

Kurdîne herdu kevanên lêvên te
hune ya li neynûkên te
xêzên bextê dildaran li kefa destê te
kurdî ye bêhna memikên te
kurdî ye hevrîşmê ber biskên te
hevrîşmê evîna winda di bazara
welatekî qulqulî de, welatekî
weke tentene yê nav destên qîzên li ber
mirazê xwe
welatekî tenteneyî weke kumê qeşmeran!!!

# KUŞTIN

bi hemû zimanên erda me
erda fireh weke basikên balefiran
balefirên ku bi hesanî, gundên me wêrankirin
balefirên gunehkar weke
bazirganên bê sermiyan
balefirên ku ava hunê tevlî xwîna seriyên
ser bi dûman kirin!

Bi hemû zimanên dinê
yekîtî û sindîkat hatin holê
hemû dizanin ku:
ji textoran re sindîkat hene
ji netew û navnetew û niştimanan re
yekîtî hene
ji cotyar û xwendevanan re
ji kevineşervan û bazirgan û rewşenbîran re
ji hozan û rêzan û polîtîkzanan re
ji karkeran re
her rengên sindîkatan hene
ez nizanim bo çî avahî ya sindîkata
kuştingeran hîna veşirtî ye, ne berçave?

Ez dizanim ku:
bira dikare birê bikuje
pîrek jî kare malxwe yî bikuje
dijmin dikare dijmin bikuje, weke ku
dost dikare dost bikuje
lê, tiştê ez nizanim ewe ku çima
kurd dikare kurd bikuje?!

## Ji Weşanên Êkîtiya Nivîserên Kurd - Duhok

1- Nivêjek mestan e li dor gunbeda Cizîrî/ vekolîn, Dr. Fazil Umer- 2004
2- Xewnên tazî/ helbest, Ruxuşê Zîvar- 2004
3- Wexerek di nihêniyên deqî da/ rexne û vekolîn, Yasirê Hesenî- 2004
4- Biyavê xwandinê/ vekolîn, Celal Mistefa- 2004
5- Liber derazînka têkstan/xwandinên wêjeyî, Selam Balayî- 2004
6- Xwandingeha birisîkirinê/ çîrok, Sedîq Hamid- 2004
7- Hizir û dîtin/ hizir û rewşenbîriya kiştî, Dr. Arif Hîto- 2004
8- Çend riyêk bo deqî/ vekolîn, Sebîh Mihemed hesen- 2004
9- Berperekê winda ji jiyannama Selîmê Esmerê/ çîrok, Anwer Mihemed Tahir- 2004
10- Çend xwandinek şêwkarî/ vekolîn, Star Elî- 2005
11- Janên sînahiyê/ roman, Tehsîn Navişkî- 2005
12- Qîses min bîlad al- Nercis, Hesen Silîvanî) çapa duyem 2005
13- Gotarên rexneyî/ komele witar, Hoşeng Şêxmihemed- 2005
14- Geriyanek di nav baxê edebê kurdî da, Reşîd Findî- 2005
15- Sotingeh/ roman Bilind Mihemed- 2005
16- Siyapoşê zêmarî/ çîrok, De- Fazil Umer- 2005
17- Şanoya hevçerx û çend dîtin/ Siyar Temir- 2005
18-Viyan di demekê jandar da/roman, Mihsin Ebid Al- rehman- 2005
19- Teknîka vegêranê di kurte çîrokên (Fazil Umerî de) vekolîn, Nefîsa Îsmayil- 2005
20- Mîrî û kevok/ çîrokên zarokan, Dr. Ebidî Hacî- 2005
21-Hejde çîvanokên gurga/çîrok, B. Mihemed Ebidallih (çapa diwem)- 2005
22- Rustemê Zalê/ filklur, Dr. Arif Hîtu (çapa diwê) - 2005
23- Şihîna çiyayê spî/ kurte çîrok, Nizar Mihemed seîd- 2005
24- Cemiserê siyê/ kurte çîrok, Salid Salih- 2005
25- Ey roj neçe ava/ pexşan, Selam Balayî- 2005
26-Ji rewşenbîriya kurdî/ vekolîn- gotar, Nacî Taha Berwarî- 2005
27- Zarokên cîhana aştî û aşopê/ vekolîn, Hizirivan Ebiduallih- 2005

28- Dihok di serboran de/ bîrewerî, Sedîq Hamid- 2005
29- Cak dirêda û helweşandin/ vekolîn, Dr. Fazil Umer- 2005
30-Dawiya şervanekî/roman, Îsmet Mihemed Bedel- 2005
31- Pêlên rexneyî/rexne, Nimet Allih Hamid Nihêlî- 2005
32-Dema hêşta giyanewer dişiyan baxivn/ çîvanokên millî, W-Hecî Cefer- 2005
33- Ber bi deqê xomalî/deq û şirovekirin, Îbrahîm Ehmed Simo-2005
34- Mêmêtîkis, ji hizirikirinê ta ku aydyolociyayê/ Dr- Fazil Umer-2005
35-Kelitor-Nasyonalîzim û erebkirin/ vekolîn, Ebdal Nurî- 2005
36- Peyvên bê perde/ vekolînên rexna edebî, Ebid Alxaliq Sultan-2005
37-Nivistin di çavê nêrgzê da/ helbest, Beşîr Mizûrî- 2005
38- Ji felsefa berxudanê/ helbest, Remezan Îsa- 2005
39- Ewê dijî hemiya/ kurte çîrok, Sebîh Mihemed Hesen- 2005
40- Nijiyargerî/ Dr. Fazil Umer- 2005
41- Bîst sal û êvarek/ roman, Sebirî Silêvanî- 2005
42-Nivêsîn di navbera nivîserên xwedawend û lêgeryan li azadiyê/ vekolîn, Hoşeng Şêxmihemed- 2005
43- Ji çîrokên millî yên filklorî/Cemîl Mihemed Şêlazî- 2005
44-Cewahir Al-mubdeîn/munaqeşat adbiye, Îsmayil Badî- 2005
45- Dîmenên peçnî/ çîrok, Kîvî Arif- 2005
46- Tîr ji kivana diweşiyên û ber tîne min/ helbest, Selman Kovlî-2005
47- Kevalekê rwîs/ helbest, Şukirî Şehbaz- 2005
48-Dewlet û eşqeka kevnar/ helbest, Deyka Daliyayê- 2005
49- Şevên bê xew/ helbest, Beyar Bavî- 2005
50- Arzandina bendemanê/ Hizirivan- 2005
51- Çaxê roj dipeyvît/ helbest, Şemal Akireyî- 2005
52-Dû çemkên havîbûn yaxîbûn/ Emîn Ebid Alqadir- 2005
53- Rastî û talan/ Sibihî Mirad- 2005
54- Deftera bê gunehiyê/ helbest, Ebid Al- rehman Bamerinî- 2005
55- Ziman û zimanvanî/ Ebid Al- Wehab Xalid- 2005
56- Evîn, xem û mirin/ helbest, Teîb deştanî- 2005
57- Zindana biçûk/ helbest, Ezîz Xemcivîn- 2005
58-Aşiq di behşteka yutubiyayî da/ helbest, Mistefa Selîm- 2005
59-Ezê di hembêza henasên te de/ çîrok, Îsmayil Mistefa- 2006
60- Roman li devera behdînan/ vekolîn, Remezan Hecî- 2006
61- Raya giştî, têgeh û pênasîn û guhorîn û pîvana zanistî/ vekolîn,

Mislim Batêlî- 2006
62-Helbesitên rengîn/helbest, W:Tengezarê Marînî- 2006
63- Tevnikera kurd, hunermenda berze/ vekolîn, W: Mesûd Xalid Gulî- 2006
64- Çapeneniyêt rewşenbîrêt devera behdînan (1935 - 2000) bîlografiya, Wesfî Hesen Ridênî- 2006
65-Şeva firîşte revîn/ çîrok, Îsmayil Silêman Hacanî- 2006
66-Gilolika aliziyaî, îdiyemên kurdî, Xalid Salih- 2006
67- Nivêjeka baranê, helbest, Heval Findî- 2006
68- Roj, helbest, Hişiyar Mihemed Hesen Rêkanî- 2006
69- Ayirdeyên viyanê, helbest, Bilind Mihemed- 2006
70- Derdê evînê(nuvlêt) Yûnis Ehmed 2006
71- Efsaneya stiranên bindesitiyê, Necîb Balayî- 2006
72- Xewneka emirîk (kumeka çîrokên Ezîz Nesîn) W: Xeyirî Buzanî 2006
73- Hizirînek di zimanê kurdî de, Reşîd Findî
74- Xanî mamustayê siyemîn, Mem Şerîf- 2006
75-Ji awazên ciwaniyê, helbest, Nacî Taha Beriwarî- 2006
76- Çend belge name yên mîjwî li dor kurdan, Dr. Selah Hirurî- 2006
77- Meşa bûkan, helbest, Hêvî Berwarî- 2006
78-Ew zelamê digel xwe ji yek cuda, şano, Siyar Temir
79- Pelên eşqê, helbest, Dirbas Mistefa- 2006
80- Şevên sar, roman, Hesen Îbrahîm- 2006
81- Helbest bo delalê, helbest, Xalid Hisên- 2006
82- Balulka şekirê, kurte çîrok, Hesen Silêvanî- 2006
83- Heyranok namên evîndaran, fulklor, Edîb Ebidullah- 2006
84- Mirin di qişleya padşahî de, kurte çîrok, Mihsin Ebid Al-rehman- 2006
85- Cîvanoka gayê sor, fulklor, Cemîl Mihemed Şêlazî- 2006
86- Selwa hêj belalîske, helbest, Loqman Asîhî- 2006
87- Bilîcan, roman, Perwîz Cîhanî- 2006
88- Lê,ilîxana goveyî,çîrok, filiklor,Mistefa Bamernî
89- Vegre- Roman, Şahîn Bekir Suwereklî- 2006
90- Qedera min- helbest- Selman Şêx Memê- 2006
91- Bihnişk- Folklor,Mihemed Hesen Binavî- 2006
92- Armanc- helbest, Sebrî Hekkarî- 2006
93- Bakurê Dil- helbest, Dilşa Yusif- 2006
94- Xwenek Binevşî- çîrok, Îsmet Mehemed Bedel- 2006

95- Nehîniyên Xamey- helbest, Sebrî Nihêlî- 2006
96- Henasek Di Peristgeha şiirê de, xwendinên wêjeyî, Selam Balayî- 2006
97- Şoreşên Barzan- helbest, Heydar Metînî- 2006
98- Aşqa me çiryeka zerdeştiye, Îsmaîl Mistefa- 2006
99- Tenhistan- helbest, Kemal Silêvaneyî- 2006
100- Şaxêd destana Rustemê Zal ê kurdî, Prof- Haçî yê Cundî- 2006
101- Maqalat neqdiye fî nusus el nercis- Mecmuat kutab- 2006
102- Dîwana helbestan, Îsmaîl Taha Şahîn- 2006
103- Dev çi nanbihîsin- çîrok, Têlî Salih Mûsa- 2006
104- Şeveka bê nivêj- helbest, Layiq Cemal- 2006
105- Paradoksîzim- lêkolîn, Îsmet Xabûr
106- Dosya Barzanî-lêkolîn, Wezîrê Eşo-2007
107- Helebçe- helbest, Seydayê Keleş- 2007
108- Çavên Sîtavkê-roman , Tehsîn Navişkî- 2007
109- Bakurê Helbestê- Antolojiya, Arjen Arî- 2007
110- Awazên Mirinê- çîrok , Nefîsa Îsmaîl Tahir- 2007
111- Sore birîna şeva min- helbest, Selwa Gulî-2007
112-Aşq di xelwetgehên mirinê de-helbest ,Aştî Germavî-2007
113- Sirûdên rojihilatî-çîrok, Celal Mistefa-2007
114- Aryana Sînorên Dûr-helbest, Mesûd Xelef-2007
115-Awazên xamaeyî/ lêkolîn û rexne, Nîametûlah Nihêlî, 2007
116 - Beyta sîsebanê/ Hizirvan, 2007
117- Ger tu mabayî/ helbest, Selman Şêx Memî, 2007
118- Leşê şevê/ helbest, Selam Balayî, 2007
119- Dalehiyên kesekê bi tenê/ çîrok, Dr. Arif Hîto, 2007
120- Çend hizirên rewşenbîri/ gotar, Nacî Taha Berwarî, 2008
121- Helkolîna zimanî/ vekolîn, Dr.Fazil Omer, 2008
122- Xewneka kîvî/ helebest, Deyka Daliyayê, 2008
124-Petromkirina gunihan/ çîrok, Mihisin Ebdûlrehman, 2008
125- Roajnên şêtekî/ çîrok, Edîb Ebdûlah, 2008
126- Roj ava dibît, da bihilêt/ helbest, Sedîq Xalid Hirorî, 2008
127- Bajêrê dînan û çend çîrokên din/ karîketore çîrok, Têlî Salih, 2008
128- Evîn û stiran/ helbest, Fêsel Mistefa, 2008
129- Govenda jînê/ , Dr. Xeyrî Neamo, 2008
130- Kepeza xewnan/ çîrok, Xmegînê Remo, 2008
131- Bênder/ helbest, Diya Ciwan, 2008
132- Sipîhistan/ çîrok- Xalid Salih- 2008

133- Hêcbûn/ têkistên edebî- Ehmed Yasîn- 2008
134- Têkist di navbera gotara rexneyî û rêbaza edebî de/Emîn Ebdulqadir-2008
135- Payizeka şîn/ helbest- Tirîfe Doskî-2008
136- Em bo çi kitêban çê dikin/gotar- Hoşeng Şêxmihemed-2008
137- Şevên pirag/roman- Hesen Îbrahîm-2008
138- Çîrokên wergêray ji kurdî bo îngilîzî/çîrok- Loqman Asîhî-2008
139- Deh xewin/komeka helbestvana- helbest -2008
140- Rapirsîn û rawergirtin/vekolîn- Misilm Batêlî-2008
141- Varê/têkistên Edebî/Xalid Hisên-2008
142- Pira Arta yan bihayê giran/sê şanoyên wergêray- Enwer Mihemed Tahir-2008
143- Tirsa bê didan/roman- Helîm Yûsiv-2008
144- Bîrhatinên Serxweş/helbest- Sîrwan Qiço-2008
145- Payiza peyvan/ lêkolîn- Sebirî Silêvanî-2008
146- Meydana koçikan/çîrok- Îsamîl Silêman Hacanî-2008
147- Çend stêrên geş di helbesta nû ya kurdî de(kirmanciya jêrî)/Xelîl Duhokî, vekloîn, 2008.
148- Dîwanên Botanî/Sebrî Botanî, helbest, 2008.
149- Ziman û edeb û mêjûya kurd di(Rojî kurd)de 1913/Hecî Ceafer, vekolîn, 2008.
150- Laveja kevine warekî xembar/Gulnar Elî, helbest, 2008.
151- Sinorên vekirî/ Îsmaîl Badî, komeka hevpeyvîna, 2008.
152- Pesnên Amedxanê/Henîf Yûsuf, helbest, 2008.

www.duhokwriters.net

# NAVEROK


Diyarî ---------------------------------------------------- 5
Amedim ez ------------------------------------------------ 6
Lewja sînoran -------------------------------------------- 21
Helbesta çekdar ------------------------------------------ 30
Kotika qul ----------------------------------------------- 32
Pirsa dengbêj û tirsa deng ------------------------------- 39
Destpêk -------------------------------------------------- 40
Li banê ye li xwarê ye ----------------------------------- 41
Tême berve te -------------------------------------------- 42
Xaniyan ava dikim ---------------------------------------- 43
Bîranîn -------------------------------------------------- 46
Kî dizanê ew kî ye --------------------------------------- 48
Ji bo dîlaneke nerm -------------------------------------- 51
Ev çî ye ------------------------------------------------- 53
Siwarbe sîwaro ------------------------------------------- 54
Careke din ----------------------------------------------- 55
Nizanim ez ----------------------------------------------- 56
Mirovên nêremê ------------------------------------------- 58
Narîn ---------------------------------------------------- 61
Setem ---------------------------------------------------- 62
Pirs ----------------------------------------------------- 64
Çi bêjim ? ----------------------------------------------- 65

**Zengil** ---------- 66
**Zanim ewe** ---------- 68
**Bêje ji min r** ---------- 69
**Ne xeme** ---------- 70
**Gava te qêrîn hilneda** ---------- 71
**Dezgirtî** ---------- 73
**Çemo !** ---------- 74
**Dema reş** ---------- 75
**Bilind dibû** ---------- 76
**Li ser bejna koçerî** ---------- 77
**Sî û çar silav** ---------- 89
**Kuştin** ---------- 96